# Medrese ve İlahiyat Kavşağında
# İSLÂMÎ İLİMLER
# (Uluslararası Sempozyum)

## المؤتمر الدولي للعلوم الإسلاميّة بين المدارس الدّينية التّقليديّة والكليّات الدّينيّة المعاصرة

## Islamic Sciences at the Crossroad of Madrasah and Theology
## (International Symposium)

**29 Haziran - 1 Temmuz 2012**

**29 June – 1 July 2012**

**2. Cilt**

**Editör**

**Yrd. Doç. Dr. İsmail NARİN**

**Bingöl Üniversitesi Yayınları**

**2013**

# şêweyê xwandinê limedresên Kurdstanê devera Badînan wek nimûne

**Tehsîn Îbrahîm Doskî**[1]

medrese di zarav û mustelehê kurdan da bo wî cihî diête gotin yê feqîyan bo wergrtina zanînên şer'î qest dikrê، û pitr caran avahîyê wê yê cuda û serbxwe biww، û bi rex mizgeftê ve bû، û pitr ji melayekê (mucaz) ewê di nav kurdan da bi navê seyda، yan melayê dwazde 'ilm dihate nasîn، ders lê digotin، û îcaze didan..

û devera (Badînan) jî ewa mie divêt di vê nivîsîna xwe da behsê wê bikeyn، eû devera cuxrafîye ewa berê (lizemanê 'ebbasîyan) digotê: hekarî، paşî li dûmahîya vî demî، yan piştî hingî bi demekî، û piştî mîrnşîna amêdîyê bi destên mîrên binemala (Behaeddîn - Behaeddînan - Badînan) li başûrê devera hekarî hatîye avakrn، navekê dî wergrtî، û biuwîe devera (Badînan) wek paldan bo mîrên deverê، paşî ev nave belavtr lê hat، heta ji tuxwîbê xwe yê cuxrafî jî derkeftî، û biuwîe nav li ser wê lehceyê jî ya xelkê vî cihî pê diaxivin.

û demê em li dîroka vê deverê dizvrîn، bi taybetî ji layê zanîn û rewşenbîrîyê ve، em dibînîn her ji sedsalên despyekê yên hatina îslamê eû bûbû cihê qestkrn û vehewyan û akncîbûna hijmareka zana û şêxên navdarên serdemê xwe، wekî bo nimûne:

- **şêx îslamê hekarî**، 'elîyê kurê ehmedê kurê ywwsfê qureyşî (1018-1093 zi) ewê hatî qesta deverê kirî، û li gundê dêreşê li rojhelata amêdîyê akncî biuwî، û medrsek li wêrê avakrî، û bi sedan salan zana lê hatîne perwerdekrn.

- **şêx 'edîyê hekarî**، 'edîyê kurê musafrê emewî (1074-1161 zi)، ewê hatî qesta lalşê li rojhelata dihokê kirî، û tekîya wmedresek avakrî bi salan zana û sofî û xudênas lê hatîne perwerdekrn.

1 [tehsindoski@hotmail.com]

- **îmam mihemed elbaqr**، ewê gorê wî dikefte wî cihî yê medresa quba dikeftê li amêdîyê، û her çende em çu ji jîn û serhatîya vî îmamî nizanîn jî، belê dwîr nîne -wekî ji navê wî dîyar dibt- eû yek ji îmamên binemala pêxemberî bit -slav lê bin- li ser demê ʻebbasîyan hatbte vî cihî û medresek bo belavkrna zanînê ava kirbt، û ev medrese her ewe ya piştî hingî medresa quba li ser hatîye avakrn.

- **şêx yûsifê erdebîlî** (erdebîlidikefte welatê îranî)، ewê gorî wî jî dikefte nêzîk gorê mihemed elbaqrî، bi rex medresa quba ve، û eû yek ji seydayên vê medresê bû.

ji vê çendê bo me aşkera dibt ku hêşta li zemanê ʻebbasîyan، û berî avakrna mîrnşîna Badînan، ev devere cihê medrese û zanayan bû، û eger em berê xwe bideyne wan kitêban ewên navên zanayên îslamê têda hatîn، li wî demî û piştî hingî jî، dê bînîn gelek zanayên mezn ji vê deverê rabuwîne، wekî -bo nimûne-: zanayên malbata (ibn dirbas)î kiû ji oycaxa maranî bûn، û tefsîrzanê navdar mweffeqeddînê kewaşî، û zanayê mezn îmam zeyneddînê ʻîraqî، û gelekên dî.

û piştî danana mîrnşîna Badînan ji layê mîrên binemala mîr behaeddînî vie (iewa piştî hingî bi navê binemala mîr sêfdînî jî hatîye nasîn) û ji ber girngîdana mîrên vê binemalê bi medrese û zanayan layê zanstî û rewşenbîrî li deverê zêdetr pêşkeft، û medreseyên deverê bûne rûgeh û cihê qestkrna zana û feqîyan ji gelek layên Kurdstanê.. û li vêrê me divêt reng û şêweyê xwandinê li medresên Badînan bikeyn، wek nimûne li ser şêweyê xwandinê li medresên Kurdstanê، û bi hizra min eû li hemî deverên Kurdstanê gelek yê cuda nîne.

**şêweyê xwandinê li medresên Badînan:**

şêweyê xwandinê medresên Kurdstanê li her cih û devereka hebt، hieta demekê nêzîk jî، gielek yê jyek ciwda niebww، û belkî ciwdayî di navbera van medresan da ji cihekî biۆ cihekê dî، hiema bi tinê eû bit kitêbek li vî cihî dihate xwandin، û li cihekê dî kitêbeka dî li şwîna wê dihate xwandin.. û di gelihindê jî dê bêjîn: feqî li medrese û mizgeftên devera Badînan heta digehşte ber îcazê، û dişîya bibte mela، divîya wî qiwwnaxeka dwîr û dirêji derbas kirba، û li vêrê me divêt hevalînîya feqî di vê qûnaxê da bikeyn، her ji roja yekê ya wî têda qesta medrese û hucrê dikr، û heta îcaza xwe werdgrt، û dibû melayê dwazde ʻilm.

**(ya fettah ya rezzaq)**

**yan roja yekê di jîyana feqî da:**

heta nuke jî li devera Badînan demê mirovekî divêt karekî biket، dê bêjit: (ya fiettah ya rezzaq)، û bielkî gielek hebn nezann ku eve gotina feqî ya yekê bû، li yekemîn roja wî têda dest bi qûnaxa xwe ya dirêji dikr..

û ʻedet eû bû demê zarokê kesekî digehşte şeş heft salîyê، û wî vîyaba eû wî bidante ber xwandinê، eû da destê wî girt û bete nik melayî li medresê، yan jî li mizgeftê، li wan cihên medrese lê neba، û da ji melayî xwazt eû zarokê wî qebwîlibiket da bibte feqî li nik wî.

û tiştê pêtvî li vêrê îşaret pê bêtedan ewe ku zarokê kur bo medresê yan mizgeftê dihatebrn، belê eger zarok kiç ba eû bo vî cihî nedhatebrn؛ çunkî mebest bi danana zarokê li ber xwandinê eû bû eû bibte mela، û kiç nedbû mela، leû di hizra xelkî da çu me'na bo hindê nebû kiç bête danan li ber xwandinê، leû jina kurd pitr caran keseka nexwandewar bû، û kêm caran wesa çê dibû kiç li maliyan li nik jineka xwandevan fêrî xwandinê biba.

pştî melayî eû zarok bo feqîyatîyê werdgrt، da bêjite babê wî: tu kierem kie hiere، û bila zarokê te bimînt.. û yekemîn tişt melayî dikre di destê feqî da (czîya elîf bêtkê) bû، û mexsed bê eû cizîya biçwîk bû ya herf têda di gelihindek tiştên destpyekê yên fer، wekî: sûreta elhemdê، û tehîyat، û hindek tiştên dî yên kurt.

û li serê vê cizîyê ya nivîsîbû: (ya ellah، ya fettah، ya rezzaq) û mebest pê eû bû ya xudê eî veker û rizqdeh، tu ryekê li ber min veke û bi sanahî bike، û têgehştinê bi rizqê min bike.. û bi vê çendê karwanê feqî bi (ya fettah ya rezzaq) dest pê dikr!

paşî feqî dest bi xwandina her (28) hefan dikr yên di zimanê ʻerebî da heyn، yekemîn car rengê wan û navê wan، wekî : (e - elîf، b - bê، t - tê ..) û heta dûmahîyê، paşî eû fêrî herekan jî dibû، bi vî rengî: (elîf ser e، elîf ber o، elîf cir iî) û digotine vê xwandinê: (qerî û hecî) û eû guhorîna (qraet û tehecîyê)ye، ye'nî: xwandin û zarkrn.

û di gelixwandin û zarkrna van herfan feqî dihate fêrkrn ku wan binvîst jî، û bo vî karî wî deftereka taybet yan hindek per hebûn، herf bi xetekê xuşkok têda dinvîsîn، digotinê: sernvşt، yan sermeşq، û ji ber ku feqî ji nwî xwe fêrî nivîsînê dikr، gelek caran xeletî û kêmasî di nivîsîna wî da hebûn.

ehmedê xanî di dûmahîya (mem û zîn)ê da di geliqelemê xwe diaxivit، û dibêjitê:

**xettê teye sernuşt û sermeşq**

**sih sale xetê xeta diket meşq**

ye'nî: her çende eve sîh sale tu dinvîsî jî، belê hêşta xetê te sernvşt û sermeşqe.. tu bi durstî fêrî nivîsînê nebuwî، wekî wî feqî yê sermeşqê nivîst!!

û piştî wî xwandin û nivîsîna hemî herfan bi dûmahî diîna dest bi xwandina peyvan û lyekdana wan dikr، û dest dida xwandina fathê، û bi vî rengî dest pê dikr:

(elîf ser e، ʻê ber ʻu، waû cizme، zaliber zu.. ʻuz) û hosa da vêra çit heta sûret bi

dûmahî diîna، û piştî wî cizîya elîf bêtkê bi dûmahî diîna û dest bi xwandina cizîya ‘emmayê jî dikr، û eû ji dûmahîê vêra dihat، ji ber sûretên dûmahîyê dikurtin، wî çend sûret bi vî rengî (qerî û hecî) dixwandin، heta baş fêrî xwandinê dibû، ji nwî ev rengê xwandinê dihêla، û bi rengê surştî dixwand.

û hejîye bêjîn ku li devera Badînan demê feqî digehşte sûreta (alkafrun) eû nedxwand، di ser ra baz dida، û seydayê wî digotê: hema tu vê sûretê xelet bixwînî dê kafr bî! leû hindek caran wî quran xitm dikr bêî vê sûretê bixwînt، tirsîya kafr bibt!!

û gelek caran demê feqî quran xitm dikr، babê wî -ji keyfan da- xwarneka berfreh çê dikr، û mela û feqî û kesên dî jî bo xwarnê vedxwandine mal، û hindek kesan piştî xitmkrna quranê xelatek (pare bit yan tiştekê dî bit) dida wî melayî yê quran nîşa daî، û di vê qûnaxê da hindek mela (yan quran xwîn) hebûn pare yan tiştekê dî beranber karê xwe ji babê feqî werdgrt، û gelek hebûn jî bo xêra xwe ev kare dikr، û çu tişt ji mala feqî wernedgrt.

û di vê derbareyê da hindek gotin wekî pyekenok dihatine vegêran، wekî demê feqî dixwand: (!nh kan twaba) mela da bêjit: mirîşka reş kibbabe، bo melaî sewabe.. û gelek pyekenokên dî yên bi vî rengî.

pştî feqî quran xitm dikr، û tiştê berçav li viêrê ieû biwû li medresên me girngî nedda ji berkrna quranê، her çende feqîyan bi dehan metinên serfê û nehwê û mentqî yên asê ji ber dikrn! me got: piştî xitmkrna qiwrianê ji nwî qûnaxa durst ya feqîyatîyê dest pê dikr، û li devera Badînan، heta demekê nêzîk jî، feqî nedşîya îcazê werbgrt û bibte mela heta sê qûnax derbas nekrban، eû qûnax jî eve bûn:

**qûnaxa yekê:**

qûnaxa destpyekê، û hingî digotinê: (mubtedî) û eû peyveka ‘erebîye bo wî kesî diête gotin yê dest bi tiştekî diket، her wesa digotinê: (suxte) jî، û bi rastî min nezanîye kanê mexsed bi vê peyvê çîye، û aşkeraye ku eû bi farsî bi ramana (sotî) diêt. û di vê qûnaxê da mubtedî yan suxte hêşta zarok bû، di bin deh salîyê da bû، û yekemîn tiştê suxteyî li devera Badînan jê dest pê dikr، piştî xitmkrna quranê، eû bû wî dest dida xwandina (nûbara ehmedê xanî)، da ku eû fêrî zimanê ‘erebî bibt، çunkî nûbar wekî em dizanîn ferhengeka vehandîye، peyvên kurdî ‘erebî didante beranber yek û du، û lazm bû feqî nûbarê ji ber biket.

û piştî eû ji xwandin û jiberkrna nûbarê xilas dibû، wî dest dida xwandina van kitêban yek li dwîv yekê:

- kitêba (metin elxaye welteqrîb) ewa bi navê (feth elqerîb) diête nasîn، ku di ‘ilmê fiqhê daye li ser mezhebê îmamê şaf‘î، ji dana qazî ebû şuca‘ê esfehanîye. û

ev kitêbe li serî dihate xwandin، da feqî ehkamên dînî yên fiqhî wekî nivêjê û rojîyê bizant.

- û piştî hingî feqî dest bi xwandina ‘ilmê serfê dikr، û li devera Badînan sê kitêb pitr ji hemîyan di ‘ilmê serfê da dihatine xwandin، eû jî eve bûn: (bnaء) û (‘zzî) û (emsle).. û li hindek cihan ev ‘ilme bi kurdî dihate xwandin، û eû kitêba kurdî ya dihate xwandin tesrîfa mela ‘elîyê teremaxî bû، û hindekan li şwîna kitêba (‘zzî) kitêba (meqsûd) yan (merah) dixwand، û eû jî di ‘ilmê serfê da bûn، û hejîye bêjîn ku feqî ev kitêbe hemî jiber dikrn، û jebrkrna wan tiştekê lazm bû.

- û piştî vê çendî mubtedî dest bi xwandina ‘ilmê nehwê dikr، û yekemîn kitêb dihate xiwandin kitêba (el’ewaml) bû ya ‘ebdlqahrê curcanî، wan eû dixwand û ji ber dikr، û kitêbeka kurdî wek şerh li ser vê kitêbê hebû ji layê mela ywwnsê erqetînî ve hatbû danan، û bi navê terkîba mela ywwnsî dihate nasîn، hindek feqîyan eû dixwand، da baştr tê bigehn.

- wpştî ‘ewamlê kitêba (se’dullah kiçk) ku şerha ‘ewamla curcanî bû، dihate xwandin، bêî bête jiberkrn.

û li viêrê qiwwnaxa destpyekê bi dûmahî dihat، û tiştê berçav di vê qûnaxê da eveye:

1- ji ber ku feqî di vê qûnaxê da ji layê ‘emrî ve ji hevalên xwe yê biçwîktr bû kar pitr dikeftine di sitwîy wî da، wekî kiؤmkrna ratban، û mebest bi (ratban) li viêrê înana xwarnê biwû ji malan biؤ feqîyan، û li hindek cihan hindek malên destinîşankrî hebûn wekî mala meznê gundî dana xwarnê bo feqîyan bi sitwîy xwe ve digrt، û her car feqî diçûne malên wan bi tinê bo înana ratban، û li medresên mezn li ser demê mîran، miedresê weqf hebûn، leû feqîyan hewceyî bi komkrna ratban nebû، û ji bilî komkrna ratban hindek karên dî jî hebûn feqî pê radbûn، wekî: paqjkrna medresê yan hucrê، înana daran bo sotinê، û avê bo vexwarnê، û çend karekên dî.

2- di vê qûnaxê da، ji bilî xwandina quranê، sê ‘ilm dihatine xwandin: fiqha şaf’î، û serf û nehû.

3- zimanê xwandinê kurdî û ‘erebî bû، çunkî feqî hêşta ‘erebî baş nedzanî، belê tiştê berçav eû bû xwandina kurdî (jblî jiberkrna nûbara xanî) ya îlzamî nebû، û bi vê çendê medrese cihê yekane bû yê zimanê kurdî lê dihate xwandin، û ev xwandine bû gelek caran feqî palddan ku bi edebîyata kurdî agehdar bibn û paşerojê girngîyê bidene berhemên kurdî.

**qûnaxa duwê:**

d viê qûnaxê jî da her digotine şagrdeyî: feqî yan suxte‹ û eû di xwandina xwe da çendekê pêş dikeft‹ û eû kitêbên di vê qûnaxê da dihatine xwandin eve bûn:

- şerha muxnîyê‹ û muxnî kitêbeke di ʻilmê nehwê da ji danana ehmedê çarprdîye‹ û şerha wê ya mela mihemed kurê ʻebdrrehîmê cîlanî. û divîya ev kitêbe bête jiberkrn.

- paşî tesrîfa mela ʻelîyê eşnwîy dihate xwandin‹ û eû timamkrna tesrîfa zencanî bû‹ eve di ʻilmê nehwê daye.

(û heta vêrê feqî herdem metinên xwe ewên wî ji berkrîn dubare dikrn‹ da ji bîr neket‹ û kitêbên qûnaxa yekê wî di gelifeqîyên ji xwe biçwîktr dubare dikrn‹ û digotine vî karî: tekrar‹ û ji vêrê wêve karê wî jî kêmtr lê dihat‹ ji ber ku ʻemrê wî meztr lê dihat‹ û zanîna wî jî zêdetr lê dihat‹ vêca pitr rêz lê dihategrtin).

- paşî kitêba şierha seʼdeddînê teftazanî li ser mietinê ʻizzî di ʻilmê serfê da dixwand‹ û bo kurtkrn digotinê: seʼdînî. û ji ber ku eû şerheka dirêji bû‹ eû nedhate jiberkrn.

- di dwîv da kitêba (helielmeʼaqd şerh elqewaʼd) ya ehmedê zîlî yê toqatî dixwand‹ û eû şerha qewaʼda ibn hişamê ensarîye di ʻilmê nehwê da. û heçîyê vîyaba metin ji ber dikr.

- paşî risaleya wezʼê wya istʼarê dihate xiwandin û jiberkrn‹ û di van herdu ʻilman da du risaleyên mela ebûbekrê mîrrostemî hebûn gelek caran dihatine xwandin û jiberkrn.

û piştî vê çendê qûnaxa dwîy bi dûmahî dihat‹ û tiştê berçav di vê qûnaxê da eveye:

1- heta nîva qûnaxê suxteî eû tiştê di qûnaxa yekî da jiberkrî her dubare dikr‹ da jibîr neket‹ û pitr caran bi şevê heta direng eû bi vî karî radbû.

2- bi rojê wî kitêbên rêzê yên vê qûnaxê dixwandin‹ her wesa metinên qûnaxa yekê di gelifeqîên qûnaxa yekê tekrar û dubare dikrn.

3- û eû ʻilmên feqî di vê qûnaxê da dixwandin çar bûn: nehu‹ serf‹ wezʼ‹ istʼare‹ û metinên jiberkrnê kêmtr bûn.

4- di vê qûnaxê da çu kitêb bi kurdî nedhatine xwandin‹ belê gelek caran feqîyan şiʼrên melayê cizîrî bi taybetî‹ û li vê dûmahîyê yên ehmedê nalbend ji ber dikrn û bi

deng digotin، û ewên hez ji şi’rê û vehandinê dikr، di vê qûnaxê da dest bi çyekrna şi’ran dikr.

5- her çende di vê qûnaxê jî da wekî ya borî suxte bi karê medresê û feqîyan radbû، wekî komkrna ratban، û paqjkrna hucre û medresê، belê ji bier kiû ’emrê wî çendekê zêde dibû، û wacbê wî di xwandinê da bi zehmettr lê dihat، karê wî yê dî kêmtr lê dihat.

**qûnaxa sêyê:**

û di vê qûnaxê da digotine feqî: (muste’îd)؛ çunkî wî eû kitêbên di qûnaxên borîn da xwandîn dubare (î’ade) dikrn، û harî seydaî nîşa feqîyên kêmtr ji didan، û zanînên wî bi vê çendê dubare û nwî dibûn، û demê feqî digehşte vê qûnaxê eû diçû ratban، û wî çu şolijî nedkrn، û wek nîv seydayek dihate hijmartin!

û her çende eû eû li nik seydaî hêşta feqî bû، belê eû di gelifeqîyên ji xwe kêmtr seyda bû، û dereca wî piştî ya melayî bû، leû melayê cizîrî navê muste’îdî di geliyê melayî vedgêrt، demê dibêjit:

**tu ji melayî biprse esrarê ’işqê hielidikt**

**vê mu’emmayê çi zann sed mela û muste’îd**

û vê çenda he gelek caran yeka hind ji muste’îdê çê dikr eû xwe mezn biket، û zêde di xwe bigeht، û xwe ji zanayan bihjmêrt، her çende eû ne ji zanayane، ji ber vê çendê ehmedê xanî demê behsê wan kesan diket ewên xwe bi rexnegrîyê diînne der her çende eû rexnegr nînn jî، eû navê (mwste’îd) li sier didant، çunkî muste’îd xwe bi mela dizant، û eû bi xwe eû hêşta feqîye، û dibêjit:

**lê hîvî dikm ji muste’îdan**

**herfan negrn li mustefîdan**

û eû kitêbên feqî di vê qûnaxê da dixwandin eve bûn:

- kitêba (elfewaid elzîyaîye) ya ’ebdrrehmanê camî، û eû şerheke li ser kafîya ibn elhacbî، û di ’ilmê nehwê daye û bi navê (camî) diête nasîn، û metinê kafîyê divîyaba bête jiberkrn. û ji bilî vê kitêbê hindekan kitêba se’dlla gewre jî dixwand، ku şerha teftazanîyê bû li ser metinê muxnîyê di nehwê da، û hindekan şerha sîwwtî li ser elfîya ibn malkî dixwand.

- piştî vê çendê dest bi xwandina ’ilmê mentqî dikr، û eû kitêbên dihatine xwandin eve bûn: muxnî eltullab ya mehmûdê mexnîsî، û eû şerha îsaxûcîye، û şerha

fenarî di gelihaşîya (qewliehmed) li ser (rsaleya ebherî)، û haşîya ʻebdllahê yezdî (yan şerha xebîsî) li ser tehzîba teftazanî، û şerha mehmwwdê razî li sier risaleya ielşemsyye ya necmeddînê qezwînî، (û eve bi zehmettrîn kitêb bû bo feqîyan!).

- piştî mientqî dest bi ʻilmê kelamî dikr، û şerha teftazanî li ser ʻeqaida nesefî dixwand.

- paşî dest bi ʻilmê beyan û bedîʼ û meʼanî dikr، û kitêba şierh eltelxîs ya teftazanî، iewa bi navê muteuwelê diête nasîn dixwand، belê çunkî eû ya dirêji bû li van dûmahîyan (muxtesera wê) dihate xwandin.

- paşî şerha celaleddînê mehellî li ser (cemʼ elcewamʼ) ya ibn sebukî di ʻilmê osûlielfqhê da dixwand.

- û her di vê qûnaxê da hindek kitêbên fiqhê şafʼî jî dihatine xwandin، wekî: feth elmuʼîn، û minhaca newewî. û di ʻilmê tefsîrê jî da tefsîra elcelaleyn paşî tefsîra beyzawî dihate xwandin.

wpştî feqî ev kitêbe bi dûmahî diînan، eû dişîya daxwaza îcazê ji seydaî biket، û di ahengeka taybet da îcaze bi nivîsîn ji layê seydaî ve bo wî dihatedan.

û piştî wergrtina îcazê hindek feqî (yan melayên nwî) ji xwandinê radwestan، û hindekên dî hêşta berdewamî dida xwandina xwe، û li nik seydayekê mezn hindek kitêbên dî di ʻilmê felsefê û hisabê û hendesê û felekê jî da dixwandin، û hindekan piştî xwandina van ʻilman ji nwî îcaze werdgrt.

û gelek caran heta feqî ev hemî kitêbe dixwandin jîyê wî ji sîh salan derbas dibû، û piştî hingî eû dibû seyda melatî dikr، û ders û îcaze didane feqîyan.

û hêjayî gotinêye ku feqî demê digehşte qûnaxa musteʼîdîyê، wî maf hebû melatîya remezanê biket، û mebest bi melatîya remezanê eû bû li wî cihê çu melayên resmî li mizgefta wan neban، demê dibû heyva remezanê، hindek ji xelkê wî cihî diçwwne miedresê، yan wî cihê feqî lê heyn، û daxwaz jê dikr eû feqîyekî di geliwan bihnêrn؛ da melatîya wan biket، kibarê bo biket، û nivêji û terawyhan li bera wan biket، û xutbe û weʼzan lê biket.. û beranber vê çendê wan fitre û zekatên xwe didanê.

û eû feqîyê maf heî vê çendê biket musteʼîd bû.

**çend têbînîyên giştî:**

1- xwandina medresên me (texessus) têda nebû، anko: feqî heta îcaze wergrtba wbba mela، wî gelek ʻilm dixwandin، û di çû qûnaxan da wî ʻilmekê bi tinê û pitr ji ʻilmên dî nedxwand، leû şarezayya wî di wan hemî ʻilman da hebû yên di kitêbên rêzê da dihatine xwandin.

2- dwazde ʻilm dihatine xwandin، leû di gotine wî yê îcazê werdgrt: melayê dwazde ʻilm، û eû ʻilm jî wekî me ji kitêbên rêzê dîtî، û li dwîv tertîba xwandinê eve bûn: fiqha şafʼî، serf، nehû، wezʼ، istʼare، mentq، ʻilmê kielamî، beyan، bedîʼ، meʼanî، osûla fiqhî، tefsîr. û li vêrê îcaze werdgrt، û yê vîyaba piştî hingî hindek ʻilmên dî jî dixwandin، wekî: felsefe û hisab û felek.

3- di medresên me da girngîyeka zêde bi wan ʻilman dihatedan yên mela digotê: (ʻlum al ale) anko: eû ʻilmên bo mirovî dibne amîret bo zanîna şirîʼetî، wekî ʻilmê zimanê ʻerebî، û mentq.. wekî ʻilmî ʻilmê quranê û sunnetê girngî pê nedhatedan، quran nedhate jiberkrn û tefsîra wê nedhate xwandin، tefsîrek du tê nebn، wekî beyzawî û zumexşerî، eû jî pitr bi serf û nehû û mentqî ve digrêdayî bûn.

4- û bi hizra min egera girngîdana seydayên me bi ʻilmên aletî bo hindê dizvrt، zanayên zincîra seneda îcazê ya serekî li Kurdstanê (ku di delveyeka dî da dê li ser axivîn) hemî yan bara pitr ji zanayên zimanî û mentq whkmetê bûn، wekî curcanî، û razî، û şîrazî û gelekên dî.

5- di şêweyê xwandinê da pitr ji xwandina rexneyî girngî bi (jberbrkrn) û (telqîna) dersan dihate، leû feqîyên me demê dibûne mela pitr (muqelld) bûn ji hindê ku hizra xwe bidene karî، û tiştekê nwî biken.